# TEVN





Silav û rêz xwendevanên hêja

Em deh jinên Kurd ji zindana Xarpetê ango ji warên Şêxneyan, Mazluman we hemiyan bi rêzdarî silav dikin.

Gotinek Seydayê nemir Cigerxwin heye, dibêje ku "Kurdno mal xerabno yan bi kurdî bi axivin yan ji nebêjin em Kurdin." Li gor me ji peyeke di cihdaye. Dema ku em bi Kurdî di axivin, bi Kurdî dinivîsin û her wekîdin kelecanîyek û keyfxweşîyek dikeve dilême ji ber ku her gele ji me ji bajarekî Kurdistanê hatiye. Mexseda me mina welatê me gelek rengdare, tenê cudabûyineke min heye ji ber ku ez Kurdeke ji anatoliya navinim lê ew ji rengekî welatê Kurdane.

Gelê me çima ev kuwira derîst hatê? Wek tê zanîn bi salaye li ser zimanê me çanda me û erdnîgeriya me bişaftinek û qirkirinek çandî a dan diziz heye. Em dikin û nakin nikarin xwe ji vê qirkirinê xilas bikin, bila kes nebêje ku bendera vê bişaftinê li ser min nebuye, mixabin li ser me hemiyan ji çebiye dive em ji xwe dîvê hêlê de ne xapînin. Tev van sedemane û gelek sedemên din, me ji hewil de ku em bi zimanê xwe kovarekê derbixin hatê.

Gelê hevalan, em dizanin ku ter migar bi serê xwe pirtukeke, ne geygese ku em bi temamî binivîsînin. Ji ber vê yekê hevalên me bi kurtasî nivîsandin. Hevala Necmiye dibêje "Bîraka ji Agir", Hevala Mizgîn dibêje "Pezgala Perwerde", Hevala Silan dibêje "Parastina Cewherî", Hevala Emîne dibêje "Wêjeya Kurdî Dijî", Hevala Femziye dibêje "Ziman Bingeha Jiyanêye", Hevala Mihriban dibêje "Ceyikên Kurd", Hevala Dilan dibêje "Roj û Jin", Hevala Hulya bi Xaçepirsekê tevlê me dibe û Hevala Berîtan ji bi wênegên xwe di nav kovarê de cihê xwe girtî ye. Hemu hevalan ji xwestin bala bikêşinin ser jiyana gelê Kurd û serpêhatiyên welatê xwe û bi kurtasî binivîsînin. Helbet tiştê ku sed sale digewime bi kovarekî naqede. Lê me ji xwest bi kurtasî qalê bikin. Bê guman kêmasiyên me çêbune, lê em dizanin gelê me we me efu bike û me di nava keredîya dile xwe di veşêre. Gelê mina gelê Kurd fedakar, qehreman, dil pak û mirovîn li tu derên Cîhanêde tuneye. Her tim ji bey azadiya xwe û azadiya welatê xwe her tiştê xwe feda kiriye.

Em ji wek girtiyên siyasî dibêjin bila dilê gelê me rihet be, pişti teritiyê her tim ronahiye. Em dizanin ku "Hêvî ji serkeftinê bi rinxdare." Emê hêvî bikin, xîret bikin û têkoşîn bikin di dawiîde ji teqez bi ser bikevin.

Leyla GÜVEN
Zindana XARPETÊ

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1


01.08.2021
Beritan ANAHTAR

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

# Ziman Bingeha Jiyanêye

Ya ronî û eşkere ewe ku mirov li cihekî jiyane û bi zimanekî axivîne bi derbasbuna demê hêdî hêdî zêde bune. Bi negarî ber bi vî alî û wî aliyê cîhanê vegune û belav bûne. Bi vî awayî wek civak, kom û deste hatine dabeşkirin her komekê jî, ji xwe re şêwe û zimanekî taybet peyda kiriye. Hemû zimanzan li ser vê, li hev dikin kû ziman di despêkêda sofî bûye û dibejin kû ziman ji dengê ba, baran, jîndar, kar û tevgera mirovan derketiye holê. Paşê kû mirov bi pêş ketine û şaristanî bi dest xwe ve anîne zimanê wan jî, pêş ketiye.

Li ser vê pêşketina ziman, mirovahî jî pêş ketiye û her zimanek bûye xwedî nasnameyekî. Ziman buye cil û bergê wê civakê, ji ber vê yêkêye ên ku zimanê wan windabe taziye, bê nasnameye û di dîrokêde windaye. Di her zimanîde cudahiyek heye, her zimanek xwedî taybetmendiyekê ye. Zimanên ku dîroka wan di gihêje, sê hezar sal berî zayînê, bê guman heya rojame ya îro gelek guheriye û gelek jî, ji wan winda bûne. Lê zimanên qedîm û kevnar her tim xwe parastine. Yêk ji wan zimanên qedîm û kevnare jî zimanê kurdiye, parastina xwe li ser cand, gotin û axaftina zimanê zikmakî kiriye. Heger em bibêjin xweşikbûna cîhanê bi zayîna xwezayê ye, xweşikbûna ziman jî cihê kû lê zayî zikmakî ye. Zimanê kurdî taybetmendiya xwe jî kevnarî, xwezayî bûna xwe girtiye. Xwezayî bûna wê, dema kû mirovahî pêşketî ji dengên wek kalîna mihê, lorîna gur, hêrîna kar (bizin), hirîna hesp wîzîna ba û her wekî din bi berfirehiya zoravayên cûda jî, di hemû hêlên jiyanêde hatiye axiftin. Gelê kurd li ser van dengan zimanê xwe pêşve biriye ango zimanê ji dengên xwezayî fêrbûne buye zimanê wan. Ev zimanê ku dîrokawî di gihêje sê hezar sal berî zayînê, piştî kû hêzên desthilatdar pêşkeftin bû yêk ji zimanên qedekirî.

Di hemu demên dîrokêde desthilatdar her tim civakê û gelan

gelek nivîskar û helbestvanên heya hene ku bi zimanê kurdî nivîsine. Tu kes li wan xwedî derneketibe ji berhemên wan bi nav û deng nebibin ji wan ne zimanê deshilata bi zimanê gelê xwe nivîsine û ev yek ji divê wekî tevgereke şoreşgerî bê hesibandin.

Yên ku di hêla nivîsa kurdî de kedeke bê hempa û bi zoru zehmetî xebat kirine divê her tim di bîra mirov dabe û berhemên wan bêne xwendin. Ango nivîskarên wek melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Elî Herirî, Baba Tahire Uryan, gelek helbestvanên din, ên ji rojhilatê Kurdistanê bune çiruskên ronahiyê. Ev helbestvan û nivîskarên kurd li hember ziman û çandên serdestan xwedî li ziman û çanda gelê xwe derketine. Bi du wan de ên ku mîratê wan hilgirtine û di rêya wan de meşiyane, divê ew ji neyên ji bir kirin yên wekî Ehmedê Xanî, Celadet Elî Bedirxan, Cigerxwîn û her wekî din. Gelê kurd her tim minnetdarê wane.

Tev van nivîskar û helbestvanên kurd ên ku ji bo zimanê kurdî, li berxwe dayî û bune parazvanên herî mezin jinin, di dîroka herî kevnare heya rojame ya îro, bê guman parazvanên zimanê kurdî jina kurde jinen wek Celale Xanima Loristanî Rihan Xanima Loristanî, Lisa Xanim, Dayê Xazona Serketî, Fatime Xanima Goranî, Nêgîz Xanima Şêrozanî, Semen Xanima Dewdanî û gelek jinên din ên kurd bi zimanê kurdî, nivîsine û hune ximên zimanê kurdî. Heger zimanê kurdî heya rojameya îro hatibe bi keda va jinan û di berdewamiya wan de ji ên ku tu carî ji zimanê xwe lêvenebuyî bi kurdî axivî, bi kurdî nivîsî, bi kurdî çîrok, helbest, gotin, çand û hunera xwe daye jiyandin û zarokên xwe bi kurdî mezin kirin, dayikên kurdin ango ên ku jiyan tevahî bi kurdî xemilandine jine. Ji ber vê yekê ye ku divê mirov wateya civakbunê, mirovahiyê û xwebuyînê ji cihê ku lê dayî bi gire dest û ji wir xwebuyînê û civakbuyînê ava bike ew bingeh ji jine û zimanê wêye.

Mirov di jiyanê de çiqas ziman fêr bibe ew qasî başe. Her zimaneke, mirovek e, lê di nava vê fêrbunê da divê mirov zimanê xwe yê zikmakî, ji bîr neke, ji ber ku bisaîtina herî zêde di vê hêlêda pêş dikeve û bi derbasbuna demêre zimanê zikmakî te ji bîrnakirin û di bin wê zimanê da netewek tê winda kirin.

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

bê vin û wekî "keriyekî pez" ditine kû bê cerandin. Heta qirnê nêzjî teorîsyenên wekî (Gustave Le Bon) Gelan ango civakê wekî keriyê ajolan nirxandiye kû divê bên kedî kirin û yên wekî Hitler jî li ser vê şopê meşiyan, gel û civak wekî "tiştekî" bê vin di mejiyan de bi cih kirine li ser vê xeta ideolojik bê hesap operasyon li ser gelan pêk anîne.

ELAZIĞ ... KAPALI C.İ.K. ... Komisyonu ... - 1

Di dîrokê de her tim cudatî di navbera zimanê desthilatan û zimanê gelde hebuye. Li Rojava bi sed salan zimanê latînî bû zimanê dewletên Ewropî û zimanê herî bi bandor. Li Rojhilata navin jî zimanê Erebî heman ristê leyist. İmparatoriya Osmanî jî li hember zimanê Tirkmenî zimanekî, wekî boxçika pînekirî li hev anî. Ji aliyê din ve li Rojhilat ji diroka kevnare bi girc heta serdestiya İslamê ji zimanê Farisî serdest bû. Zimanên desthilatan bi gotinên desthilatiyê, zimanên gelan jî bi gotinên jî cand, dîrok û hişê civakê dagirtine û li hember zimanê desthilatan, zimanê gel bi awayekî ontolojik bi hêztire, kurtire û dem dirêjtire. Zimanên desthilatiyê bi zora hêzên ne rewa hebûna xwe li ser civakên pir zimanî ferz kiribin ango bandor kiribin jî ev hêzên wan ên ser civakan izafîne. Lê zimanê gel xwe di mejî, cand, dil û hişê civakê de bi cih kiriye û hêza xwe, rewabuna xwe ji wir girtiye.

Di qirnên 16.17. an de têgihînên wekî zimanê Fermî û qedexe kirina zimanên din tune bûn, ev dahênanên netew dewletane. Lê ew zimanên navên wan derbasbun bi zimanên din re bazarek ava ne dikirin. Di heman demê de kesên kû bi zimanê desthilatan ne di axivin wekî kesên "hov" di hatin ditin.

Li hember vê rastiyê ji bo ku zimanê gel bi mine û bijî gelek hewildan ji pêk hatine. Her wisa li hember zimane desthilata, bi kar anina zimanê gel wekî pîvaneke şoreşgeriyê ji hatiye ditin. Ji bo ku zimanên gel li hember zimanen desthilatan bên parastin, nivîskî jî hewildan çêbune. Bê guman di nav kurdan de jî,

Kurdan ji mêjuveye dest bikaranîna tîpên latînî kirine lê vê yêkê ne azadiya ziman û ne jî azadiya neteweya kurd bi xwe re anî. Berûvajîya wê di qirna 20'î de zimanê kurdî tev li netewe ya wî hat qedexe kirin. Heger ku di roja îroyîn'de pêşiya zimanê kurdî vebûbe ev jî bi saya Tevgera Azadiyê û Şehîdên Kurdistanê û saya ked û xebatên mirovên hêja û berxwedana gelê kurd û jina kurd pêk hatiye. Ya ku ji niha û pêşve berme di keve ewe ku em bi kurdî bixwînin, bi kurdî bi nivîsin, bi kurdî bi axivin, xewnên xwe bi kurdî bibînin û bi kurdî bijînin. Da ku bibin yêk parçe û yêk netew.

ELAZ... KAPALI C.İ.K.
Mü... ...syonu
Ta... ...urdi - 1

Remziye YAŞAR

# DÎROKEK JI AGIR



ELAZIG KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Ko...
Tarafından İncelen...



Dîrokek Jî agir

Dema ku mirov behsa dîroka Kurdistan ê dike, êşeki xur û bîranînên ji agir dikevin dilê mirov. Geleki ku li ser axa xwe bi zimanê xwe, bi nirxê xwe û bi kevneşopiyên xwe bijî û ji her aliyîde di nav aramiyê de bi dewlemendî jiyana xwe bidomîne çiqas xweş e.

Lê rojeki neyarên Kurd an werin bêjin ku "Tu ne Kurd î, zimanê te hrw. tuneye", "Tu Tirkê çiyayî yî, li ba we berf zêde hebû, dema we ji pêlê berfê dikir dengê kart-kurt derdiket ji bo wî jî, ji were gotine Kurd". Ew dagirkerên ku bêjin "Tirkê mafeti we heye, ew jî; hûn tenê dikarin ji Tirk an re xulamtî bikin (Mahmut Esat Bozkurt)

Di wan çaxan de ziman qedexe be çand û hûner, wêje jî pêş nakeve. Lê dîsa jî Kurd an ne zimanê xwe, ne wêjeya xwe û ne jî çanda xwe wunda nekiriye.

Wexta em berê xwe didin dîroka Kurdistan ê, bê guman pêşî jin dikeve bîr a mirov. Wê çaxê em dibînin ku jiyaneti xweşayî û azad heye. Pêşengiya wê jiyanê jî xweda wendirî. Lê mirobin ew jiyan bi hişmendiya zilamê dagirkeran hate hilweşandin. Li hemberê vê hişmendiya zilam, jinê jî; ji bo jiyaneti azad, her tim pêşberî vî pergalê sekiniye û berxwe daye. Jin vî hêza xwe, ji jinên ku navê xwe bi lehengtî û bi berxwedanê di dîrokê de dane nivîsandin jî wana hildane. Di her fersendê de bi jinbûyîna xwe, bi nasnama xwe têkoşîn dane. Ev jinên leheng her tim bi civakên azadîxwaz re bûne û bi wan re rabûne ser piyan, bûne pêşengê wê civakê. Bi wan re hatine kuştin, bi wan re hatine işkencekirin, hatine şewitandin û hatine qetilkirin. Di jiyanê de bi hişmendiya jin ê teygeriyane. Di perwerdê de, çand û hunerê de, wêje û tenduristiyê da, di her qadên jiyanê de ji bo mirovahî û jiyaneti azad kedeti mezin dane û her tim genetîna xwe ya cewherî pêk anîne.

ELAZIĞ ... Mektup Okuma ... Tarafından İncelendi - T

Tu carî der ji lêgerîna jiyaneke azad û bi rûmet bernedane. Her çiqas ser nasnama jin ê, vîn a jinê zîm û zordarî hebu li hember wî ji her tim berxwedana jin ê ya bê hempa hebu û heye jî. Mirov dikare di hêla wêje, hûner û hwd. çend mînak ji jinên Kurd'an bide;

Di wêje û hûnerê da; Lîsa xanim, Nergis xanima Şêrezorî, Nazdan xanima Şêrazî, Di lehengtiyê da; Li Sasan ê Rindêxon, Li Dersim ê Zarife, Li Agirî yê; Firuze, Boye, Li Anatoliya navîn; Fata Reş, Li Başurê Kurdistan ê; Leyla Qasim, Li Rojhilata Kurdistan ê; Şirîn Elemhûlî, Li Bakurê Kurdistan ê; Sara, Zîlan, Berîtan, Li Rojavayê Kurdistan ê; Arîn Mîrxan, Viyan Peyman. Ev jinan di dîrokê de rola xwe lîstine, bune sembol û ketine nav dilê gelê xwe. Bi sedan jinên wek wan hebun û hîn jî hene.

Weke tê zanîn Mezopotamya cihê afirandina mîtolojî, olê, felsefê û zanista ye. Destan û efsane gelemin li wê derê hatiye ziman û nivîsandin. Wî waxê emê bibîrin dîroka kevnar. Li ser axa Mezopotamya yê gelê herî qedîm gelê Kurd e. Gelê Kurd di jiyanê de her tim bi pîvanê dema neolotîkê tevdigeriya. Di van axên pîroz de bi hezaran sal fermên ku wek qrattî, mirtî, eşîr tî, xwe ser hew jiyana xwe derbas kirine. Tu carî minnet tu kesî nekirine. Kurd ji aliyê leşkerî, nêçîrî, çandin-çinandinê û bazirganî de geleki jêhatîbûn, zîrek bûn. Ji bo wî jî minnetê wan jî tu kesî tunebu. Bi kesekî re şer nedikirin lê belê parastina xwe ya cewherî jî her dîm pêk anîne. Di lêkolînên bezûn Antropolojî, Arkeolojî, Dîrokê û Etnoknasiyê de ev mijaran bi belgeyan hatiye ispatkirin û gelek pirtûk hatine nivîsandin. Ji Sumer a heya Babîl ê, Asur ê, Hitît û Pars an li vir dijiyan. Kurd an jî, bi navê Guttî, Hurrî, Mitannî, Med hwd. demên direj hebune.

Gelo Kurd ji kîjan wextê vir de li ser axa xwe bune wek penaber an? Bi rastî mijara dîroka Kurdistan ê geleki kûr û direje. Penaberîtiya Kurd an ya ser axa wan, ji sedsalê sal berê bi destpêka belavbûyîna dewleta Osmanî û bi peymanan destpêdike.

Peymana ewil ya Syks-Picot bu. Di sala 1916 an de du ves li ser navê Îngiliz û Fransî yan civîneki bi dizî girtin û di wî civînê de ew peyman derxistin holê. Piştre di sala 1920'an de dewleta Osmanî û hevalbendên wî Îngiliz, Fransî, Italî, Yewnanistan û ABD peymana Sevr'ê pêk anîn.

ELAZIĞ ... KAPALI C.İ.K
Mek... ...yonu
Taranmıştır ...

Di vî peymanê de, ji bo Kurdan wek xweserî yanî wek muxtariyetê maf hatibû dayîn. Piştre jî, di sala 1923'an de li welatê Swîsrê û bajarê Lozanê konferansek hat damezrandin. Li ser navê Tirkiyê İsmet İnönü (yê ku bi eslê xwe ji Meletî û Kurd) tevlê bû. Di vê civînê de Kurdistan bû çar parçe. Ev biryar hîn jî di meriyetêda ye. Kurdan tu carî ev peymanê qebul nekirin, her tim serhilda û berxwe da. Ji ber ku piştê vê peymanê her rojên ku diçû, mafên Kurdan dihat binpêkirin. Gelê Kurd ji serî hilda û ketin nava berxwedaneki dirêj.

Di sala 1925'an de bi pêşengtiya Şêx Seîd serhildanek destpêkir. Ev serhildan di demeke kin de li Elezîz-Çewlîk û Amedê belav dibe. Di vê serhildanê de gund û malên Kurdan tên şewitandin. Bi gor hejmarê fermî pancdeh hezar û dused kes tên kuştin. Herî dawî Şêx Seîd û çil û sê hevalê wî dîl dikevin. Bi biryara dadgehê li Amedê qada Deriyê Çiyê tên daliqandin.

Piştê serhildana Şêx Seîd di navberên sala 1926 û 1930 an de bi pêşengtiya İhsan Nurî Paşa, serokeşîrên Kurda û rêxistina Kurda bi Xoybûn re û jinên lehenger Fîruze, Asiye, serhildana Agirî û Zîlan ê pêk tên. Di van serhildana da jî, bi hezaran Kurd tên qetilkirin.

Di 1937'an de vê carê Kurd li bajarê Dersimê serî hildidin. Bi pêşengtiya Seyit Rıza, Zarife û Alîşer ev serhildan dora saleki berdewam dike. Piştre dewleta Tirkiyê Seyit Rıza, kurê wî û yanzdeh fermandarê wî li bajarê Elezîzê qada genimê didin daliqandin. Gotina Seyit Rıza ya herî dawî ji tevahî Kurda re bû sembola berxwedanê. "Min bi fenûfindê we nekarî bila ev jî min re bibe derd, lê min jî li hemberê we çok danenî bila ev jî, ji were bibe derd." Ev gotin hîn jî di zarê Kurda daye.

Li Kurdistana Rojhilat, Rojava û Başur jî her tim berxwedana Kurda berdewam dikir. Ji Qazî Muhammed heya Mele Mustefa Barzanî gelek pêşengê Kurda ji bo gelê xwe fedakariyê mezin kirin, û jiyana xwe ji dest dan. Di van serhildana da bi milyonan Kurd hatin qetilkirin. Daxwaza dewletên neyar ew bû ku, bila Kurd werin bişaftin/asîmîle kirin. Di roja îro de jî, rêberê gelê Kurd birêz A. Öcalan bîst û dû sale di girava İmralî yê de di nava tecrîteki girankirî de girtiye. Ew rewş jî dike ber çavan ku sed sale rêberên Kurdan her tim rastê erîşên desthilatdaran hatine.

ELAZIĞ [illegible] KAPALI C.İ.K.
[illegible] Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

Dema ku Kurd a ev nezîkatî qebûl nedikir mirin, îşkence, mişextbûyîn hew derdiketin pêşiya Kurd a. Dema ku dibêjin 'Kurd çima heta niha nebûn xwedî statû"? Hewceye ku li dîroka Kurd a binêrin. Lê hewceye ku em rastiyekî jî qebûl bikin. Ew jî rastiya Kurd e ku bi gelê xwe re nemeşiyane. Hewcetî bi çend mînaka heye ku ev mijar were fêhmkirin.

Mînak; Selahaddîn "Eyyûbî" Kurd e lê ji bo ku dewleta Îslam ê ava bibe şer dike, "Îsmet Înönü" jî Kurd e lê di parçekirina Kurdistan ê de rola wî mezin e. Ser navê Tirkiyê ew tevlî konferansê dibe û îmze davêje." "M. Ziya Gökalp ku bi eslê xwe ji Amed ê ye, xebatê pantürkizm dimeşîne. Bi xwe bibu zimanzan ê Tirk a. Pirtûka "Esasê Tirkitiyê" dinivîse û bi navê -Güneş Dil Teorisi- zimanê Tirkî pêş dixe û gramera wî saz dike." "Seîdê Kurdî jî bi ser navê olê û misilmantiyê piştgirî dide neyarê xwe û aliyê wan dixebite. Xwedî gotina "Tirk aqilê me ne, em jî hêza wan in. Em ê serhişkî nekin, em ê serkeşî nekin" e.

Dîroka Kurdistan ê de têkoşîn û xayintî her tim bi hev re meşiyaye. Lê tevî van kêmasiyan jî, ew mirovên ku ji bo neyarên xwe xebitîne her tim ji aliyê Kurd an ve jî, ji aliyê dewletên din ve jî tu carî bi baştiyê nehatine rojevê.

Lê yên ku di nav gelê Kurd da bûne sembola berxwedanê û Kurd minnetdarê wan in jî hene. Ên wek; Apê Musa, Zara, Zîlan û Berîtan, wek; Wedat Aydin, Mehmet Sincar bi hezaran lehengê Kurd an hene. Em dizanin ku têkoşîna azadiyê ne ewqas hêsane ye. Keda gelê me yê sed salî li ber çavan e. Gelê Kurd mal hebû da, can hebû da. Ji bo doza xwe, her tim canfeda bû. Mirov dema li cihanê dinêre dibîne ku, nêzîkî pencî milyon milet be û bê statû be! Ji Kurd an bêtir kes tuneye. Ji bo vê yekê jî, têkoşîna ku heta niha hatiye dayîn hewce ye ku berdewam bike. Ji bo ku em hatine dema serkeftinê Hewcetiya me bi yekîtî û îtifaqê ji nav xwe were avakirin. Berpirsiyarên Kurd a ya çarparçeyan gere bi lez û bez werin gel hevdu û yekîtiya neteweya xwe pêk bînin. Ji bo ku desthilatdaran di nava hewildanekî dane ku jedsale ki din, ji bo Rêxistina navîn xiz bikin. Ji bo vê yekê jî em î wek jinê Kurd û gelê Kurd dibêjin ku bila êdî kes ji bo me sînora xêz neke. Em ê sînorê welatê xwe û azadiya xwe bi têkoşîna xwe ava bikin.

Bila dost û neyar herkes bizanibe ku, vîn a kurd a, hebûna kurd a, nasnama kurd a ji îro pê ve nayê înkarkirin. Hewce tuneye ku hêza kurdan cardin were ceribandin. Gelê Kurd û pêşengê Kurda sed sale bi secnekî xurt, xwe nîşanê tevahiyê cîhanê dane ku "Yan jiyaneki azad, yan ji qet!"

Di sedsala 21. de dema netewdewleta qediyaye. Her milet di nava hewldanan da ye ku, dixwazên welatê xwe demoqratiktir bike. Lê em Kurd, di vî mijarê de bextewarin ku proja me ya netewa demoqratik heye. Di vî modelê de Paradîgmaya demoqratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê heye. Ev model niha li Rojava yê Kurdistanê bi pêşengtiya jinan tê honandin. Em dizanin ku ev modela demoqrafîk ji aliyê gelên welatên cûda cûda ve, ji nêz de tê şopandin û pejirandin. Ji bo ku ev model di cîhanê de ya herî demoqratîk e.

Her çiqas Kurd niha di zindana dil hatibên girtin û li tevahî cîhanê bûye parabar jî, pêşketineki gelekî mezin derketiye holê. Em ê wek jinê kurd, ciwanê kurd, gelê Kurd ev dîroka ku hatiye berovajîkirin, serrast bikin. Em ê jiyaneki exlaqî, polîtîk û bi rengê jinê, bi xemilandina dayîka, bi enerjiya ciwana biafirînin. Ne tenê ji bo gelê Kurd re, em vî jiyanê azad ji bo gelê Rojhilata navîn tevahîre dixwazin wek "Zana" ku gotiye "Hevî ji serketinê bi qîmetî re". Em jî hevî dikin, xîret dikin û tekoşîn didin. Em ê teqez bi ser bikevin. Wek gotina Çiyager; "Çi dibe bila bibe, dawiya wî be hempa be".

Necmiye BOZ

ELAZIĞ ... İncelendi

Zindana Xarpêt

15.08.2021



Beritan ANAHTAR

Zindana XARPETÊ

ELAZIĞ ... KAPALI C.İ.K.
Mektup ... Komisyonu
Tercüman ... - 1

# Wêjeya kurdî dîjî

Wêje ji bo hemû netewan amraza ku hebûna xwe bas peyt dike ye. Wek xwe û gelê xwe parastin wêje, ji dîrokê heya roja me ji bo gelekê tune kirin bi destê dagirkerayve a herî dibin hedefande ye. Ji ber ku wêje û berhemên wêjeyî his. hêst û hebûna netewanin. Ya ku netewe li ser lingan digire ziman û wêje ye.



Nasîna wêjeyên kurdî nasîna berî 12 salre derbas dibe. Nasîna wêjeya kurdî di civata xwedawendade, gotinên dengbêjande, di pênûsa ahmedê xanêre derbas dibe.

Wêjeya kurdî şert û mercên gelek dijwarde ava bû û mezin bû. Sînorên ku dinavbera kurdan hatî xiskirin, înkarkirina hebûna kurdan û qedexeyên bê dawî... Desthilatdarên ku ev sînor xiskirî xwestin kurdî û hebûna kurd dinav tirkî, erebî û farisîde bihelînin. Lewra pêşketina çand, hûner û wêjeyê bê navber hat qedexe kirin û asteng kirin.

Wekî ku tê zanîn perwerde kirina zarokan destpêke di malbatê de tê dayîn. Dinav kurdande mezin kirina zarokan gelek balkêşe. Civaka kurd zarokên xwe bi dengê xwe perwerde dikin. Ev perwerde kirin ne bi tenê malbatêve sînore civakiye. Ji ber ku ev gotinênhe nirxên herparin. Ev perwerde kirin ne biser û bere. Xweza jî ye, kur û dirêje. Şev û roj nema ye ku kal û pîr behsa çîrok, pend, efsane û hwd. bikin. Şev nemane ku dengbêj bêdeng biminin. Afirînerên civakê jin, wêjeya kurdîde jî gelek mezin listine. Bi taybetî wêjeya devkîde xwedawendan wan şevên dirêjde zarok perwerde kirine. Wêjeya devkîde him kal him ji pîr gotinên xwe bi azat anîne liser ziman. Gotin dibe mem û zîn, hirq û ruvî, ken û girî heskirin û mirin.

Wêjeya devkî dê dewlet dinav jiyana xwezayîde bi hemû tekûziya xwe berî 12 hezar salî Yerabrezk ê liber çavane. Quling û rûvî yê ku liser kevirê çikandî hatî xiskirin dinav kurdande tiştên ku herî baş tê zanîne, mirov bi rehetî wan nîgaran dikare di fablên kurdade bibîne

Lewra êrîşên ku bi destê desthiladaranwe tê kirin destpêkê bi polîtîqayên qedexe kirina ziman tê kirin. Ehmedê Xanê berî 300 sala berhema xwe mem û zînêde wiha dibêje.

Kurmanc ne pir bê kemal in
Ema di yetîm û bê mecal in
Filcimle ne cahil û nezan in
Belkî di sefîl û bê xwedan in

Wek tê zanîn ku kurd hertim wek nezan û cahil hatin dîtin wek netewek bêkes desthiladar nahelin kurd bi zimanê xwe dibistanan bixwînin nivîsîning û lêkolînan bikin. Ji berê heya rojame li hemberî hemû qedexan û êrîşan wêjeya kurdî hal astek serfefî.

Dema xaldiyanda gelek wêjevanan îro ji dinav kurdande herî baş tê zanîn jiyane.

Xaldiyan li cizîr û botanê bi navê xwe dewletek damezirandine. Dewleta wan heya serdema bedirxan paşa ma. Xaldiyan ji fermanê re wêjeya cizîrê ji bo xebat bûna wêjeya kurdî, ji bo pêşxistina canda kurdî û ji bo pêşxistina cardinêya zor têkoşiyane wan di maveya fermandariya xwede geleke pir û karvanserа çêkirine û qîmet dane çand û wêjeya kurdî di serdema xaldiyande, gelek hunermend, wêjenas, zana û lêkolîner derketine holê û xizmeteki mezin ji ziman û canda kurdîre kirine ku em dikarin çendan ji wan bi vî awayî binav bikin; Alî Herîrî, şêx ehmedê cizîrî, feqiyê teyran, bekir begê erzî, şêx ehmedê xanê, ehmedê mele batî, mirad xanê bozdî, şa pertewê hakarî (Dîroka wêjeya kurdî-feqî huseyn sağnıç - rupel 363) Çend ji van zanistan hene ku bandoret mezin liser gelê xwe ava kirine ku navê wan di rojamede bi minet tê serziman.

Bê jin nasîn û tarîf kirina wêjeya kurdî gelek lewaz dimîne. Di cemeata ehl-î heqqde gelek helbestvanên jin hene ku di civaka kurde nayê nasîn. Yaresanî di sedsala 8. de di milê behlûlê mahî - medîwc hatiye ava kirin. Li ser rêya heqîqetêde yaresanî baweriya xwe bi rêya helbest û muzîkê tîne ziman. Divê baweriyê û çandêde çalakvanên civakê yê herî xurt jinin. Ew bi rol û mîsyona xwe ya dinav gelê ehl-î heqqde pîrozin. Jinên yaresanî diderbêq û cemande berhemên ku nivîsandi bi tembûrê gotine. Yên ku di nivîsêde aktîf cih girtî; Liza xanim, celalê xanima loristanî, katun Dagratî Razbar, Rihan xanima loristanî, Katûn Zorbenûya Derzyanîye. Wan helbestên xwe bi zaravayê goranî nivîsandine.

Piştî serhildana şêx seîd ji bo wêjeya kurdî nifşek nû derket. Nivîskarên vê nifşê tucar bi rehet û azad berhemên xwe ava nekirine. Ew an di zindanande

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
-Tarafından İncelendi-

Bi veavabûna bejar-cîn û dewletê bi derketina Pawaneyê, wêje ne tenê ket dibin denetîmê ji her hat hilbijartin ji. Desthilatdaran ji bo berjewendiyê xwe ji nûve şêwe kirin. Şerên ku di rojilata navînde hati derxistin, xwe wek xweda ditin bi gotinên "Ez mezinim" "Hêz ji min tê pirsîn" ve dîroka mirovatiyê bi êrişên hovane hat xirakirin. talan kirin. Heçi berê xwe da rojilata navîn nîklê xwe li axa kurda, zimanê kurda, hunera kurda, Canda kurdan, berhem û hebûna kurdan da.

Ehmedê Xanê di mem û zînêde êriş û zilma ku liser kurda hati kirin, axa kurda Cawa hatiye perçe kirin bi zimanê helbestî anîye ziman

Bifkir 'ereb betla ve gurcan
Kurmancîye bûye subhe burcan
Ev rom û 'ecem wan besar in.
Kurmancî hemî li Car kenar in
Her du terefan qebîle, kurmanc
Bo tîrê qeza kirine amanc
Eu qulzumê rom û bahrê tacik
Cava ku dikin xurûç û tehrîk
Kurmanc dibin bi xxwînê muletex
Wan jêkve dikin misalê berzax

ji bili Ehmedê Xanê tiştê ku hati serê kurdan xweşî û nexweşiyê xweve em dikarin di wêjeya devkî de bibînin. Evdalê Zeynikê. Ew bi deng û gotinên xwe dilê gelê xwe rehet kiriye. wi bi dilê xwe hertişt ditiye. Lewra ew pîrê kurdan ne.

wêjeya devkî ji nûve şîrove kirin, ji bo ku neyê ji bîr kirin û bê nasîn. Kedên gelek mezin hat dayîn. Li hemberî hemû qedexeyan wêjeya kurdî dijî û tê nasîn. Êrişên ku liser nivîskarên kurd heta mirina wan û piştî mirina wan ji liser nav û berhemê wan berdewam dike. Li sertê pirtûkxane ya bi navê "Celadet alî Bedirxan" bi destê qayumêve hat girtin. Carekedin hat xwestin nenakbirê kurd dinav kurdande liser welatê xwe nemîne aw û serkeftinên wî neyên bîranîn. û pîroz kirin. Nivîskarên kurd kengê ji bo nivîsa kurdî pênûs kiribe destê xwe an hatine işkence kirin û girtin. an ji hatine surgun kirin. Mehmet Uzun dibêje "xwedê kesê neke pûna nivîskarên kurd." Ez bawerim gelek rupelên wêjeya kurdî, dibin axede rizî bûne. Gelek ji ji wan dema binCavkirin û girtina nivîskaran û helbestvanan de dest danine Cer. Tekilîya kurdan û wêjeyê bi rêyên cur be cur hertim hestine bê birin. Ya ku girink ewe ku ji xwe wêjeya kurdî dinav gelde bi rêya gotinê hatiye parastin. Ji hewildanên nivîskaran wêjeya devkî liser rûpelên pirtûk, kuvara hat resandin

wêje û ziman bêguman herdure dibin xwediyê netewa xwe. Heger zimanê geleki tunebe tê we wateyê ku ew gel ji tune ye.

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

an ji welatê bîyanî bi sefaletî û dinav qirîzên siyasî û aborîde dest avêtine wêjeya kurdî. Celadet Alî bedirxan 15 Gulanê sala 1932'an de bi karanîna tîpê latînî bi alfebeya kurdî kovara hawarê derdixe. Hawara kurda êdî dirije liser rûpelên kovara hawarê. Gelek nivîskar û helbestvanên kurd yên demê nivîsê xwe vê kovarêde diweşinin. Hawa sînoren ku di navbera kurdande hatî xiskirin derbas dibe û xwe digihijîne dostê nivîskaran û gelan.

Celadet Alî Bedirxan kovara hawarê hejmara 27'an de wiha dibêje "Ev roj di jiyana kurmancan a civakî û edebîde rojeke tarixî ye. (prof. kadri yildirim - kürt tarihi ve çağrafyası / sayfa 333) Bi berdewamî ji bedirxan bangavasî li yên ku hinê zimanê xwe nabe dike. Hezonîna ziman rûreşî dibine û rezixê xwe dike. Yên ku bi zimanê xwe dinivise wan pîroz dike. Pesnê wan dike. Celadet Alî Bedirxan divê demêde hawara ku cihet taybet di jiyana kurdide digirî ji bo xwedî derketina ziman, çand û wêjeyê nivîsekê ji di weşîne. Di kovara hawarêde gelek nivîskarên hêja nivîs û helbestên xwe diweşinin Osman Sabri, Cigerxwîn, Qedrîcan û goran ji wan kesanin. Van nivîskaran di dema xwede gelek bîryarên xirap ditin. Bi hewildana van nivîskarên, wêjeya kurdî hat astek serfeflî. Wêjeya kurdî ji xewê şiyar kirin. Ji bilî van nivîskaran bêguman gelek nivîskarên kurd hene ku li vê rêjede ked dane. Piştî kovara hawarê kovarê gelek girînk derketin. Ronahî, gelawêj, roja nû hwd. heta 1960 gelek kovarên wêjeyî derketin. Piştî vê demê ji gelek pirtûkên kurdî derketin. Êdî wêjeya kurdî biriqî û di cihanede hat nasîn. Bi salan ku herî dawî de têkoşîna ku ji bo qedexeyên sed sale hate dayîn. Karanîna ziman û pêşketina wêjeya kurdîde encamên girînk hat standin. Di rojamede berhemên gelek xurt derdikevin. Her çiqas gelek ji wan berhemen kurdî be ji nivîsandina zimanê bîyanî ji gelekin. We fikrêdeme ku nivîskarên kurdî divanin binivîsînin û bixwînin, lê belê tirkî-erebî û farisî û zimanên din dinivîsinin tirsawane we ku berhemên ku derdixin neyê xwendin. Keda ku nivîskar helbestvan, dengbêj û xwedawendê welatê kurdan pêwiste ku neyê jibîr kirin. Bi rûpelên ev ked nayê nivîsandin. Her çiqas xwendina kurdî dinav civaka kurde ne pêşketiba ji lê belê çiqas kurdî bê nivîsandin ewqasî ye bê xwendin. Ji bilî van gelek kal û pîrên kurd hene ku folklora kurdî di mejîyê wande

ELAZIĞ ... KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelenmiştir

bi nivîskî ge. Pêwîste ku ev ji bê
nivîsandin. Em vê xizinê dizanin li ku-
derêye. Hê ev xizine ji destê mede
neçûyî pêwîste ku bê lêkolîn kirin
û bê nivîsandin. Bi vi bo nasina
nasnameya kurdî, wêje hûner û Çanda
kurdî bi hezaran pirtûk hene ku hewcîya
xwendinê ne.

Heger endamê neteweke di der-
hegê Çanda xwe, ziman, wêje hûnero
xweda ne serkeftî be. di derhegê
Çand, ziman, wêje, hûnera tu netewes
de tû Çarî serkeftî nabe. Ji bo
ku hewceye mirov barî barê bi nas
nameya xwe tev bigere û ~~kentêli~~
milleteke wek gelê kurd bi sed sa-
le di seride ziman û hertiştên
wan qedexe bo lê li hemberî hemû
qedexeyan di seride saya ziman
ev çand heta niha parastibe
wê ji iro û pêve ji dibin her
şert û mercanda gelê bê parastin.
Em wek gelê kurd mixetarê
wan kesanin. Yên ku wêjeya kur-
dî parastine

Nav ji wegre.


Emine ERKAN

ELAZIĞ ... KAPALI C.İ.K.
... Komisyonu
Tarafından İncelendi



30.07.2021

Beritan ANAHTAR



# Parastina Cevherî Giyan

Di roja mirovahî ava buyî heta rojame ya îro xwe parastin, her dem hebuya. Ne tenê mirov, ajal, xweza û her woha tevahî zindî xwe di parêzin. Gava mirov bi xweze dîroka xwe parastinê bi-zane divê mirov biçe dema ne-olotikê, di dema neolotîkê da teknolojî tunebu, tevahî xweza, mirov û ajal, bi hevre jiyane, ne mirova ziyan daye xwezayê, ne jî xwezayê ziyan daye mirova. Ji ber ku jin, pêşengtiya civakê dike, di nava xweza û jinê de têkiliyekî simbiyotik heye. Nêrina jinê di wê demêda li hember xwezayê zindî buye û xweza her tim zindî dîtiye. Ji bo ku jiyana xwe bi domîne, ji xwezayê sûd digire û dest bi çandiniyê dike. Bi vê têkiliya bi xweza û axêre di navbera jin û xweza de rehên jiyanê bi hevre tên girêdan.

Dema mirov lêkolîn dike, mirov dibîne ku parastina cewherî li her derê pêk pêk tê di cihanê da her tiştê zindî bi awayên cuda xwe di parêzin. Mirov di kare li ser vê gelek mînaka bide, bi kurtasî wek mînaka "Gulê" gul di nava xwezayêda tişteki herî xwesiko ber bi çave bi strî yên xwe, xwe di parêze. Eger striye wê tunebon, ne di karî xwesikbuna xwe bi parêze. Mînaka din kurmê "Çil pê" (12êv) ci-hê kû lê diçe tifa xwe dike. Ji ber kû tifa wî, bêhn jê tê, mirov nikare nezî bibe ew ji bi wî awayî xwe di parêze. Ev her du mînak ji nîşanî me dide. Ku di gerdunêde tu tişt bê parastina cewherî nîne.

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından

Em dikarin bêjin ku di sed sala 21'min de êm ku herî tê ne talan kirin û bin pê kirin di bin desthilatdariya zilam de jin û xweza ye. Ya yêkemîn ewe ku vina jinê hatiye tesî kirin. Tundiya herî mezin li hemberî jinê hatiye kirin. Rêberê gelê Kurd di vê mijarê de gelek tistên balkêş û girink anîne ser ziman, her tim di bêje ku hemu zindî hewceye ku parastina xwe ya cewherî bike. Li ser van gotinên Rêbertî û bi wê Felsefê îro bi hezaran jinên Kurd li her qadê parastina xwe ya cewherî pêk tînin. Hewceye ku bê zanîn parastina cewherî tênê bi tek yan ji bi fîzîkî nayê kirin. Jin divê li hember desthilatiya zilam ya li ser hişmendî, beden û nêzîkahiyên zayendî parastina xwe ya cewherî bike, ji bo vê ji divê her hêlê da di nava legerîneki kurdabe û bi vî awayî xwe, xwezaya xwe û civaka xwe li hemberî hişmendiya qirêj ya zilam bi parêze. Bê guman des desthilatdariya bi hezaran salane li ser jin û xwezayê tê kirin ew qasî sanahî nayê çareser kirin. Ji ber vê yêkê ye ku em dibejin jinê parastina xwe ya cewherî li kudere winda kir divê xilas buna xwe jî li wê dere bi dest bixe û ev bi salane jin di nava ve tekoşinê dane, li hemberî hemu zor û zehmetiyan li ber xwe didin.

Piştî ku hêzên serdest pêş ketin, ji bo berjewendiyên xwe teknolojî pêş xistin û talan kirina xwezayê dest pê kir. Xweza ji bi şikleki parastina xwe dike, eger di rojame ya îro de ew qasî, lehî, şewata daristan, erd hej û gelş buna axê hebe û karesatên mezin çedibin. Mirov di kare bi bêje xweza tola xwe ji mirovahiyê distîne.

Di heman demê de, di nava civakêde xwe parastina cewherî buye wek suce ki, yanî yên ku di xwezin xwe û civakê li hemberî hemu erîşen curbe cur, bi parêzin ji aliyê hêzên desthilatdar ve tên dil girtin. Dema em bala xwe didin zindana, avakirana zindanan bi destê zilam hatine avakirin û bi vê avakirinê xwestin ku ên ku xwe diparezin bibin xulamê wan. Lê li hember hemu erîşan ji girtî bi gotinê, bi nivîsê, bi jiyana xwe ya kominal, bi terz û uslubu xwe, bi çalakiyên xwe, parastina xwe ya cewherî dikin. Bila bê zanîn ku, ji wan yok ji zindan ji bo jinên şoreşker ne cihê xulamtiyê ye, di her alî de cihê xwe parastina cewheriye.

KAPALI C.İ.K.
Komisyonu
incelendi

Rastiya jiyanê ewe ku cihê mirov lê digî, bi rêxistin bike û bi rêxistinî bigî. Ji bo vê jî, her tim di nava parastineki dabe. Mina Heval Zîlan di qada çiya de, mina Heval Sema di qada Zindanê de, wekî Heval Arîn Mîrkan di qada bajarde, ji bo parastina gelê xwe, her yek jiwan bun mesalek ji agir u di nava dilê neyar de teqiyan û bi hezaran hevalên wek va hevalan canê xwe, ji bo parastina gelê xwe fedakirin. Gelê Kurd wan lehengên xwe tu carî ji bir nake. Ji ber ku va hevala peywira xwe ya parastina cewherî, ji bo gelê xwe pêk anîne û teulî karwanê şehidên nemir bune. Ev jî tê wê wateyê ku her mirov bi cand, huner, ziman û birdoziya xwe û rêxistinbuyîna xwe parastina xwe ya cewherî pêk bîne.

Tev wan gotinên ku me anîn se ziman, tişteki dardixe holê. A rast ewe ku, tu zindî bê parastina cewherî nikarin jiyana xwe berdewam bikin.

Gelên wek gelê Kurd û tevahî, gelên bin dest, jinên cihanê, milletên kêm netew û her wekî din, tu carî dest ji xwe, parastinê bernedin, wê caxê serkeftina wan, bê guman wê pêk bê. Em jî wek jinên Rojhilata navîn di bejim ku emê dibin her şeft û mercen de parastina xwe û welatê xwe bikin.

Slav û Rêzê Şoreşgerî

Şilan AVAREŞ

Diyariye...

Ev nirxandin, ji bo jinên ku parastina cewherî pêk tînin.

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1



ELAZIĞ KAPALI CEZA İNFAZ KURUMU
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi


Di welatê bindestande rewşa dayikan
Dayik wateya Jiyanê ye.

Ji ber ku helwesta dayika her tim parastina mirov di Jiyana ajalade wê rastiye bi awayekî ber bi çav dibine. Wê çake em dikarin bejin ku hêstâ dayikê cuda ye. Bê guman ew derguşa xwe neh heyva di paşila xwe de hildigire. Di rewşa heyî û tûnetiyade wan meziŋ dikin. Dixwazin her tim zarokê wan şad û bextiwarbin. Lê dayikên rêşilata navin dikir nakir nikarin ku jiyaneke aram Ji zarokên xwere peyda bikin. Dayik her tim dibejin bila ez bimrim lê zaroken min başbin. Di stranen xwe de dibejin serwane kezî ya dayika bi qurbana. Dayikên aşitiye û dayeken şemî bi solayê li kolanan de digirin û aqibeta zarokên xwe dipirsin ka tû berpisyar bersiva wan nade. Em wek ciwanên kurd soz didin dayikên xwe ku emê tekoşînê bigihijinî armancê. Eme Ji dayiken xwe yê fedaker Jinanek bi rûmet di nava aşitî û aramîde bi aşirinin û digari wan bikin. Bila dilê wan rehet be.

Ji dayikên cihanê re

Silav û hûrmeten bo dawî

Mihriban Şerli.
Zindana Xarpetê



"BİZİM TOPRAKLARDA

ÖNCE KADINLAR UYANIR

SONRA GÜNEŞ DOĞAR

KADINLAR DOĞURUR."



Dilan AYDIN

Zindana Xarpetê



Beritan ANAHTAR

Zindana Xarpetê

# PERGALÊN PERWERDÊ

Perwerdeya nûjen, sala 1800 de di civaka rojavayî de şikil girtiye. Di nav perwerdeyan de mijarên cur be cur henin. Perwerdeyên zanistî, civaknasî, Derûnî, felsefî hwd. Lê bele vê nivîsede emê gelemperî li ser pergala perwerdeyê bisekinin. Perwerdeya ku em dixwazin û perwerdeya pergala kapîtalîzmê emê li hevberkî parve bikin.

Perwerde di demekî direje bûye qadên şerên siyasî. Hemû pergal ji bo berjewendiyên xwe nesî perwerde dibin. Ji bo vê ji dibistan bûne qadên nakokiyê çînî û zayendî.

Berî her tiştî bi gelemperî perwerde çiye?

Ferhengê de wateya perwerdeyê; Hevatin kirine.

Di perwerdeya nûjên de Perwerde, bi navbêykariya saziyên fermî tê dayin. Armanc hinkirina pergalê ye. Nivîsên pêş de emê yek bi yek parvê bikin.

Di Rêveberiyên Kapîtalîzmê de Perwerde Çawa ye û Dibistanan de Çawa tên Dayin?

Zarok heya pênç salî di nav malbatên xwe de tên perwerde kirin. Edî piştî pênç salî navbeynkiriya dibistanan vê di nav diwarên hanandî de, bi destê mamosteyan ve Zarok; ji xwezaya xwe, civaka xwe, çand û zimanê dayika xwe tên qetandin. Di hişmendiya zarokan de perwerdeyek zayendî, ferdperestî, bişeftî tên çewimandin. Mijarên sarweran nerî bi destê mamosteyan ve tên parve kirin. Perwerdeyên Pergala Kapîtalîzme li ser jiberkirine hatiye damezirandin. Ji bo vê ji dibistanan de perwerdeyên ku tên dayin şagirt, bi tenê guhdarî dikin û mîna bi şikleki mekanik hemû pirsan jiber dikin. Şagirt, mîna bidana pewistê ku be tijîkirin û guherandin. Paulo Frier, Pirtûka xwe ya Pedegojî ya Bindestan de perwerdeya vî şiklî re "Modela perwerdeya Bankavan" dibeje. Di perwerdeya Bankavan de; Armanc şagirt ji bo berjewendiyên xwe pasîf kirine. Perwerdeyên vî şiklî re em dikarin du, sê mînakan wiha bibêjin.

Mamoste di pozîsyona her mijarên de bi zana ye. Lê belê şagirt der heqê mijaran de tiştekî nizane.

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

Mamoste hemû mijaran de vebêjer e. Şagirt bi tenê guhdarî dike. Mamoste ji bo ku pergalên perwerdeyên serweran şagirt ta rêzkarî dike. Şagirt jî bê lêpirsîn bi rêzkar dibe hwd.

Di hemû cîhanê de perwerdeya ku dewletî tên qebûl kirin. Lê belê perwerdeyên dewletî pêwîste ku bê pirsyarî kirin. Lewre perwerdeya ku tên dayîn, daxwazên serweran ne bi eşkere bi weşartî hişmendiya zarokan de tê rûniştandin. Em ji cilên ku şagirt li xwe dike bigirin, listikên ku di dibistanan de tê listin, meslekê ku zarok di pêşeroje de hildibijêrê bi awayekî zayendîtî tê hînkirin. Çîrokên ku bi destê perjoke ve tê weşandin her tim zayendî tên nivîsandin. Zarokan qîz her dem bi malêve te girêdan û rolên dayikan tê hînkirin. Lê belê zarokên lawik bê sînor tev digerin. Di nav jiyane de li ser hemû mijaren de mafdarin. Dawiyên pirtûkan de zarokên lawik xeleskar e, qîz jî heviya xelasîndanê ne. Ji bilî ve rengpên zayendî tê hîn kirin. Ramawer Ivan Illich, perwerdeyên wisa re "mufredatên veşartî" dibêje. Perwerdeyên ku bi vî şiklî tên dayîn zarokên qîzik di nav jiyane de pasîf kirin. Li ser vê jî jinên femînîst perwerdeyên wisa re "serwerên nerî" dibêjin û hemberî zayendî û çînî têkoşîn dikin.

Di dawiye de em dikarin ku bibêjin pergala perwerdeya kapîtalîzme de armanç mirovan ji bo pergalên serdestan ahengdarî bike û bi vê rê yê berjewendiyên pelçiqîneran tên parastin. Mirovên ku bindest, pergala serdestan çiqasî hindik bipirse, û bifikire ji bo ku serdestan ewqas baş e. Dema ku mirov li ser perwerdeya kapîtalîzme lêkolîn bike, pêlekî nakokî derdikeve holê. Serdestan dixwazin ku civakan bê reng, bê deng, bi çînî û bê lêpirsîn ava bikin. Bi kurtasî civak bi xwezaya xwe tên biçeftî kirin...

Beşê Perwerdeya ku em dixwazin Çiye û Çawa ye?
Ji bo me wateya Perwerde; Bi destpêka jiyanê heya dawiya jiyanê bi ceribandinê, pêvajoyê hibûn, zanebûn û pêşxistina mirovatiyê ye.

Perwerdeya ku em dixwazin perwerdeyek bê pere, zanistî û herî pêşîn jî bi zimanê dayikê ~~perwerde~~ ditine.

... KAPALI C.İ.K.
... Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

Perwerdeyên li ser binpêha jiberkirin û mekanîk em naxwazin. Perwerdeya ku em dixwazin avakirina hîm hînbûna zanist hîm jî hînbûna mamoste ye. Pewîstê ku herdu alî jî hîm bibe mamoste, hîm jî bibe zanist. Hîm bibe vebêjer hîm jî bibe guhdar. Parve kirina perwerdeyên de aliyek aktîf, aliyek pasîf naye qebûl kirin. Pewîste ku herdu alî jî beşdarên aktîf teslîm perwerdeyan bibe. Polên bi dîwar û bi sînî pewîste ku hole were rakirin. Perwerdeya ku em dixwazin Paulo Freire Pirtûka xwe de aniye ziman "Perwerdeya diyalog" dibêje. Yanî em dikarin ji ve re perwerdeyên înteraktîf bibêjin. Em dikarin perpola Sovyetan mînak bidin. Di dema Sovyetan de perwerdeyên polîteknîk hatiye avakirin. Li ser hemû mijaran de perwerde têne dayîn. Mirovan mijarên zîraat, weje, şano, werzîş hwd. her alî de perwerde dikin û pêş dixin. Weke ku rojame perwerde, li ser ezmûnên jiberkirî ava nebiye. Mirov, her mijarên de bi tecrube vê hîn dibe û pêş dike ve. Di dewleta Tirkiye jî Modela Sovyetan mînak girtiye. Di dema Ataturk hatiye damezirandin. Lê belê nave Perwerdeya Polîteknîk hatiye guhertin û navê ve biye "Enstîtuya Gundan". Armanca wan jî mîna koperatîfa perwerde dayîne. Lê belê perpola perwerdeya Tirkiye li ser hîzeftîne hatiye ava kirin. Heta ku rojame îroyîn jî ke berdewam dike. Di serî de zarokên gelên kurd perwerdeyên bi vî şiklî hatine perwerde kirin heya rojame îroyîn. Lê belê bi têkoşîna ziman di sala 2000'an şunde dewleta tirkiye mecbur man û bi saz kirina qanûna, destûrê vekirina qursên zimanê kurdî hat dayîn. Di wan dema Enstîtuya zimanê kurdî jî bo weşan û hînkirina perwerdeya li ser zimanê kurdî xebate xwe dimeşandin. Di heremê jî saziyên kurdan jî bo perwerdeyên zarokên kurd greş û dibistanên kurdî vekirin. Ji wan greş a zarokistan û bi destê rejîma îroyê ve mamoste ferzet Kemanger hatibû îdam kirin li ser navê wî dibistanên kurdî em dikarin mînak bidin.

Piştê hêla têkoşîna zimanê kurdî di 3 bajarên kurdan zanîngehan de beşa wêjeyê kurdî hate vekirin. Lê belê di ferminiyetê de ne ku wêjeya kurdî, bi navê "zimanên zindî" beş hatibûn vekirin.

... KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

Di van bêjan de xebatên tez bi kurdî qebûl nedikirin û ev nezikatî hîn jî berdewam dike. Aliki de dibêjin "me beşa kurdî vekiriye" di aliyê din de zimanê kurdî dibistana de perwerdeyên fermî de nayê qebûl kirin. Wek zimanê biyanî "dersên hilbijarî" tê qebûl kirin. Nakokiyên din; Dibên "zimanê kurdî heye!" lê aliki din jî di alfabeya kurdî de tîpên "X, W, Q" di saziyên fermî de qedexe ye. Heya zimanê kurdî di fermiyetê de neyê qebûl kirin wê zimanê kurdî û zaravayê wî winda bibe!

Zimanê gelên bindest, bi destê dewletên netew di fermiyetê neyê qebûl kirin, encama wî de; li cîhanê du hefta carekî zimanek winda dibe. Ji bo astêngiyên pêşî zimanê dayikê li hemû cîhanê de di her dibistanê de perwerda zimanê dayikê bê pere û zanîntî were dayin. Ev mafên hemû gelan e. Wekê bi gotinê pêşiya "Her giha li ser koka xwe şîn dibe!" Mirov jî bi zimanê dayika xwe şîn bide. Ez im bawer dikim ku hemû cîhanê de gelên bindest bi zimanê dayika xwe va perwerde bibin û li ser zimanê xwe şîn bibin!

Ji bo mamosteyên yekem;
Dayikên Azîtî re..

Mizgîn ÖZATİZ

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1

# XAGEPIRS

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| T | H | R | Ê | B | E | N | D | A | N | İ | N |
| R | İ | M | P | E | A | R | İ | Y | E | A | B |
| E | N | R | K | M | R | V | Z | E | L | D | E |
| B | İ | Ş | M | E | K | E | R | D | İ | N | R |
| Ş | İ | N | Ş | E | W | H | G | E | İ | M | F |
| D | J | E | Î | A | H | G | D | İ | L | B | A |
| P | M | Ê | M | J | İ | N | E | A | H | U | N |
| İ | N | R | E | Z | B | E | R | R | D | G | D |
| İ | E | M | A | N | A | F | İ | R | İ | A | A |
| S | N | F | G | G | E | L | A | W | E | J | R |

RÊBENDAN AVRÊL KÊWGER
REŞEMI GULAN SERMAWEZ
ADAR PÛŞPER BERFANBAR

## Çêkirina Xagepirsê

Di nav tîpên tevlî hevde navên 12 mehan hene
Berê hunê wan bibînin Piştî ku we tevî dîtin
tîpên ku dimînin hevokek helbestvanek yîne...
SERKEFTIN

ELAZIĞ KADIN KAPALI C.İ.K.
Mektup Okuma Komisyonu
Tarafından İncelendi - 1


01.08.2021
Beritan ANAHTAR